

## Riha nivîsandinê

Nivîsîn cîhanek taybet e ku nivîskar diafirîne û tê de dijî. Tiştek bi navê ruhê nivîsandinê di nivîsandinê de heye, bi wateya ku hûn dinivîsin.

dom»R:10



*Bideśtveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (485) 04-01-2025 Buha (1000) Tûmen*



## Rewşa Sûriye û çarenûsa Rojava

Her li destpêka serhildanan li Sûriyeyê di sala 2011an anko serdema "Buhara Erebî"de, hilweşîna rejîma Esed bû armancek sentral bo hemû dijberên wê rejîmê. Ew rewşa aloz bû sedem ku dewletên herêmî û dewletên zilhêz tew wan aloziyan bibin û hêdî hêdî ew serhildan dijî rejîmê bû şerê grûpên "proxy" û her wisa derfet û mecal çêbû bo grûpên terorîstî wek DAÎŞ û Elqaîda (Cibhet al-nusra) ku Sûryeyê bikin meydana çalakiyên xwe.

dom» R:4



## Şikesta komra Îslamî li deverê wek derfetek bo opozîsiynê

Rewşek ku komara Îslamî li deverê de tûş bûye, ked bi hederdan a hewleke dehansale ya hemûalî ye ku li dirûşma "şandina şoreşê bo derve" ve dest pêkir, bi hewldan bo çêkirina hilala Şîe û wehma dabînkirina kûrahiya stratejî li welatên derdor, berdewam kir.

dom» R:2

# Peyama rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkefta sala nû ya Zayînî

**Rêzdar Mistefa Hicrî, Berpirsê Navenda Birîveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta sersala nû ya Zayînî peyameke pîrozbahiyê belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**



Nûbûna sala Zayînî û hatina sala 2025, li hemû kirîstiyanên cîhanê, rêrevên vê olê û herwisa ew kesên ku sala nû ya zayînî de vê rojê bi cejin digrin, pîroz be.

Li rewşekê de pîrozbahiya sala nû ya Zayînî tê kirin ku Rojhilata Navîn wek devereke çendîn olî û çendîn neteweyî, rastî guherînên micid hatiye.

Li vê rewşê de hivî dikim ku sala nû ya Zayînî û rewşa nû ya siyasî, bibe sedema pêşveçona pêwajoya azadî û nirxên civakî li deverê û aşitiyeke dadperwerane, wekheviya netewan û aramiyê li pey xwe bîne.

Herwisa hivî dikim ku netewên Îranê li encama rewşa îşarepêkirî de rûkê tebayî û azadiyê bi xwe ve bibînin, bi taybet ku rêrewên ola Mesîh û olên din ji aliyê rêjîma komara Îslamî ve û bi navê pîrozî û şerîeta Îslamê, têne serkutkirin û ji azadiyên olî û siyasî û mafên wan ên bingehîn hatine bêparkirin.

Bi hêviya aşitî, tebayî, azadî û wekheviya gelên deverê

Mistefa Hicrî

**Berpirsê Navenda Birîveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**11ê Befranbara 1403 a Rojî hemberî 31ê Kanûna pêşîn 2024**



## Senaryoyên çaverêkirî ji bo Rojavaya Kurdistanê

R:3



## Divê em şaştiyên xwe yên sala 58`an dubare nekin

R:5

# Şikesta komra Îslamî li deverê wek derfetek bo opozîsiynê



**N. Îsmaîl Şerefî**
**W. Bêhzad Simko**




Rewşek ku komara Îslamî li deverê de tûş bûye, ked bi hederdan a hewleke dehansale ya hemûalî ye ku li dirûşma “şandina şoreşê bo derve” ve dest pêkir, bi hewldan bo çêkirina hilala Şîe û wehma dabînkirina kûrahiya stratejî li welatên derdor, berdewam kir.

Komara îslamî li pêxema wan armancan bi avakirina taqim û girûpên çekdar li welatên deverê, destêverdan li karûbarê navxweyê welatan û bi hederdana sedan milyard Dolar ji darayiya xelkê Îranê, heta asteke zêde bandora xwe bi ser deverê de sepandibû ku ev yeka bo rêjîmê li pirsgirêk û pêwendiyên deverî û navnetewî de giranî û karta givaşxistinê bû.

Piştî bûyera 7ê October a 2023 a Zayînî û lewazkirina Hemas û Hizbullaha Lubnanê û li dawiyê de herifîna rêjîma Beşar Esed li Sûriyê, li deverê de dawî bi hejmonî û bandora dehan saleya komara Îslamî hate.

Ew rewşa komra îslamî bilî vê ku karlêkeriyên curbicur ên siyasî li deverê kirin, bê şik bandor li ser pêkhateya rêjîmê bi xwe, tevgerên nerizayetî yên navxweyê welat û bereya opozîsiyona rêjîmê jî hebû û dê hebe.

Ew karlêkeriyane ku dibe li herduk dîtingehên gef û derfetê bê mêzekirin, li dîtingeha tevgera mafxwazaneya gelên Îranê ve zêdetir erênî û hivîder in.

Li vê gotarê de emê zêdetir bal bo ser karlêkeriyên vê şikesta komara Îslamî li ser bereya opozîsiyona rêjîmê û ji penceraya derfetê ve mêzeyî vê pirsê dikin.

Piştî herifîna rêjîma Beşar Esed, her çi qas ku Elî Xamineyî, rêberê rêjîmê li 3 derketinên cuda de hemû hewla xwe da ku bîde xuya ti tiştek neqewimiye, lê nikare seh bi şikest û herifîna rêjîma vî li deverê neke û me ev îtirafkirin ji gelek berpirsên rêjîmê ve dît, ku ew bo xelkê welat hem xweşe û hem hivîder e.

bi wateyek din, niha gelên Îranê baş dizanin ku komara îslamî ew hêz û desthilat nîne ku çendîn sale xwe pê radikêşe û gelek baş ji vê têgihîştine ku komara îslamî gelek ji wan kartan ji dest dane ku li asta dever û cîhanê de bikar tînan û givaş pê dêxiste ser civatgeha cîhanî.

Li asta navxweî de jî xelk rojane bi çavên xwe, rewşa lerzok û tejî qeyran a rêjîmê dibînin û zêdetir ji her demekê, hêviya nemana vê rêjîmê û gihîştin bi jiyaneke serbilindane dikin.

Xelk li pey derfetekê ye ku bi yekîtiyê bi hêzeke qahîm û yekgirtî, bi berçavrohnî ji paşerojê, hewl û tekoşîna xwe û erxahînbûna xwe ji gihîştin bi paşerojeke dilxwaz, îradeya xwe bidin nîşandan û bi yekcarî, dawî bi vê rêjîmê bînin.

Li vê derheqê de eva ku li wan rojanede bas ji rewşa aloza komara îslamî hatiye kirin, zêdetirîn balkêşandin bi ser tê kirin û wek hewcehiyek bas li ser tê kirin, bereya opozîsiyona rêjîmê û rol û rêkarên wan li pêxema dawîanîn bi komara Îslamî û bersivdan bi wan nigeraniyane ye ku xelkê li vê rewşê de hene.

Lewma rewşek ku komara îslamî tê kevtiye û civaka navnetewî vê demê ji dûr ve mêzeyê vê dike, bo hêz, alî û kesayetiyên dijî komara îslamiya Îranê, derfeteke dîrokî çê kiriye.

Komara îslamî bervajiyê 3 sal berî niha, ti karteke wiha li ber dest nemaye ku li rastiyê de danûstandinê bi vê lidar bixe.

Eva ku heyeta bernameya navkî û îdiayên vê heyetê kirinî, wa xuya ye ku ne li Ajansa Navnetewî ya Wizeya Navkî û ne aliyên Ewropayî ve wek pêştir digel de naçne pêş.

li rewşeke wiha de opozîsiyon dikare tevî nîşandana karnameya tejî şer û fitne û terorên komara îslamî û bi balkêşandin bi rewşa rêljîmê li dever û navxweyê welat û çavrêtiya xelkê, hem li asta navnetewî de îdiaya nûneratiya xelkê bike û hem li asta navxweî de xebat li ser komkirina hêza xelkê û nehiştina nigeraniyên wan li paşerojê bike.

Eva ku heta niha ji çalakî û hewlên bereya opozîsiyona rêjîmê tê dîtin, tevî ku opozîsiyona navxwe bi taybet li asta kesayetiyên siyasî û akademîk de dengê wan bilindtir e û rohntir ji caran bi bivêriyê ve bas ji dawîhatuina komara îslamî û derbasbûn ji vê rêjîmê dikin, mixabin hêz û aliyên siyasî yên derveyî welat bi eşkere çalakî û bizivîneke wiha jê nayê dîtin.

Xelkê welat û gelek ji kesayetiyên dijî rêjîmê li navxweyê welat û heta hêz û aliyên xuya û nexuya ên dijî vê rêjîmê li navxweyê welat ku mixabin bi sedema siyaseta serkutkirin, derfeta xwenîûşandan û meydandariyê nebûne, zêdetir opozîsiyon li derveyî welat seh bi peydabûpna vê derfeta dîrokî kirine ku hatiye pêş, ku ew jî tevê ku rexne ji opozîsiona derveyî welat, dibe dilxweşker û hivêder be.

Eva ku pêwendî bi hizb û aliyên Kurdistanê ve hebe wek beşek ji opozîsiyona rêjîmê, dibe zêdetir hişarê vê rewşê bin û xwe bo hewr egerekê amade bikin.

Bi keyfxweşiyê ve sehkirina vê giringiya peydakirina derfetan û pêkanîna curek vekhevî bo karê hevpar li navbera hizb û aliyên siyasî yên Kurdistanê tê dîtin û kar li ser tê kirin.

Bi giştî, wek gelek carên din jî kuy îşare pê hatiye kirin û gelek jî li ser hatiye nivîêsandin û gotinê, yek ji serekîtirîn pirsgirêka li ser rêya pêngavhilgirtin bo herifandina rêjîmê û dabînkirina paşerojeke geş û gelên Îranê, nebûna alternativ û cihgir bo vê rêjîmê ye ku dereng an zû- ku pêka gelek lêkdanan gelek nemaye- dibe ji nav here.

# Senaryoyên çaverêkirî ji bo Rojavaya Kurdistanê



N. Dr. Mecîd Heqî




Rojavayê Kurdistanê ku bi navê Rojava jî tê binavkirin, di qonaxeke girîng a dîroka xwe de ye. Piştî rûxandina rejîma Esed, Tirkiyê derfeta xwe bi kar anî û bandoreke mezin li ser siyaseta navxweyî ya Sûriyê kir.

Armanca Tirkiyê ya sereke ew e ku tevgera kurd li Rojavayê Kurdistanê bitepisîne û nehêle gelê kurd bigihîje mafên xwe yên mirovî û netewî.

Ev destwerdan ji ber daxwaza Tirkiyê ye ku sîstema siyasî ya Sûriyê li gorî berjewendiyên xwe pêk bîne.

Di heman demê de desthilatdarên niha yên Sûriyê bi paşerojên xwe yên tundrew û terorîstî bi tundî li dijî sîstema sekuler a ku li Rojavayê Kurdistanê hatiye avakirin e.

Di wê baweriyê de ne ku Kurd di nava Sûriyê de nebin xwedî statuyeke naskirî. Ev dijberî ji bêtehamuliya kûr a li hemberî daxwazên xweserî û xwerêveberiyê yên gelê Kurd tê.

Tevî van kêşeyan jî, Rojavayê Kurdistanê di şerê li dijî DAIŞê de roleke sereke lîstiye û di têkbirina rêxistina terorîst de beşdariyeke mezin kiriye.

Hêzên kurd li Rojava ne tenê herêma xwe parastiye, di heman demê de cîhan ji metirsiya terora cîhanî jî parastiye. Hewldanên wan ji bo parastina îstiqrar û ewlehiya herêmê pir girîng bûn.

**Senaryoyên çaverê kirî:**

**1. Berdewamiya destwerdana Tirkiyê:**

**Tepeserkirina Mafên Kurd:** Dibe ku Tirkiye polîtîkayên xwe yên êrîşkar ên bi armanca tepeserkirina tevgera Kurd bidomîne. Ev dibe ku operasyonên leşkerî, zextên siyasî û mueyîdeyên aborî yên ku ji bo qelskirina rêveberiya Kurd li Rojava hatine çêkirin, pêk bîne.

**Bêîstiqrara Herêmî:** Destwerdana berdewam a Tirkiyê dikare bibe sedema bêîstiqrariya herêmî ya demdirêj, bi pevçûnên berdewam û krîzên mirovî yên ku bandorê li gelê Kurd û deverên cîran dike.

**2. Zordestiya hikûmeta Sûriyê:**

**Dijberiya sekulerîzmê:** Dibe ku hikûmeta Sûriyê hewlên xwe yên ji bo hilweşandina sîstema laîk li Rojavayê Kurdistanê zêdetir bike.

Ev yek dikare bibe sedem ku zext û zordariya li ser mafên siyasî û çandî yên kurdan zêde bibe û civaka kurd hîn zêdetir biçûk bike.

**Kontrola Navendî:** Dibe ku desthilatdarên sûrî hewl bidin ku kontrola navendî ya li ser Rojava ji nû ve bisepînin, otonomî û xwerêveberiya herêmê têk bibin.

**3. Piştgiriya navneteweyî ji bo Kurdan:**

**Naskirina cîhanî:** Civaka navdewletî dikare beşdariya girîng a hêzên Kurdî di şerê li dijî DAIŞê de nas bike û piştgiriya siyasî û aborî ji bo aramkirina Rojavayê Kurdistanê pêşkêş bike.

Ev piştgirî dikare bibe alîkar ku mafên gelê Kurd were parastin û aştiya herêmê pêşve bibe.

**Hewldanên Dîplomasî:** Hewldanên dîplomatîk ên welatên rojavayî û rêxistinên navneteweyî dikarin danûstandinên di navbera rêveberiya kurdî û aktorên din ên herêmî de hêsan bikin, û bibin sedema çarçoveyek siyasî ya aramtir û berfirehtir.

Ji bo bidestxistina piştevaniya navneteweyî, divê Rojavayê Kurdistanê pirsgirêk û îdeolojiyên berê bidin aliyekî û di çarçoveya berjewendiyên netewî de bibin yek.

**4. Bihêzkirina xweseriya Rojava Kurdistanê:**

**Hevbendiya Navxweyî:** Rêveberiya Kurd li Rojava dikare hevgirtina xwe ya navxweyî û pêkhateyên rêveberiyê xurt bike, hêza xwe ya li hember zextên derve û parastina xweseriyê zêde bike.

Ji bo Rojavayê Kurdistanê girîng e ku xwe ji bandora partên siyasiye Kurdistaniye derwey rojava û hevrikiyên siyasî yên wêranker biparêze.

Divê Rojava Kurdistanê li ser armanceke hevbeş bisekine: parastin û dabînkirina mafên netewî yên Kurd li Sûriyê. Divê ev erk bi yekîtiyê pêk were. Niha ne dema pêşbirk û hesabkirinê ye.

**Geşedana Aborî:** Çêkirina li ser geşepêdana aborî û birêvebirina çavkaniyan dikare xweragiriya herêmê û xweragiriya herêmê baştir bike û bingehek bihêztir ji bo otonomiyê peyda bike.

**5. Potansiyela Aştî û Demokrasiyê:**

**Hevsengiya hêz:** Parastina Rojavayê Kurdistanê û aramkirina statûya gelê Kurd dikare hevsengiya hêzê li herêmê ber bi demokrasî û aştiyê ve bibe.

Herêmeke Kurdistanî ya bi îstîqrar û xweser dikare bibe modelek ji bo rêveberiya demokratîk û jiyana hevbeş li Rojhilata Navîn.

**Hevkariya Herêmî:** Berfirehkirina hevkariyê di navbera Rojavayê Kurdistanê û navçeyên cîran de dikare jîngeheke aramtir û geştir çêbike û hemû aliyên beşdar sûdmend bin.

Rojavayê Kurdistanê di çarçoveyekê de ye û hem ji aliyê Tirkiyê hem jî ji aliyê hikûmeta Sûriyê ve rûbirûyê hereşe û tehdîdên mezin bûye.

Lê belê yeketiya netewî, berxwedan û îradeya gelê Kurd bi piştevaniya potansiyela navneteweyî dikare rê li ber pêşerojeke bi îstîkrar û demokratîk veke.

Parastina maf û statûya kurdan li Rojavayê Kurdistanê ne tenê pirseke dadmendî ye, belku ji bo aştî û aramiya navçeyê jî pêwîstiyeke stratejîk e.

# Rewşa Sûriye û çarenûsa Rojava



N. Elî Munezemî

Her li destpêka serhildanan li Sûriyeyê di sala 2011an anko serdema "Buhara Erebî"de, hilweşîna rejîma Esed bû armancek sentral bo hemû dijberên wê rejîmê. Ew rewşa aloz bû sedem ku dewletên herêmî û dewletên zilhêz tew wan aloziyan bibin û hêdî hêdî ew serhildan dijî rejîmê bû şerê grûpên "proxy" û her wisa derfet û mecal çêbû bo grûpên terorîstî wek DAÎŞ û Elqaîda (Cibhet al-nusra) ku Sûryeyê bikin meydana çalakiyên xwe. Li ber yek ketina berjewendiyên dewletên curbecur li Sûryeyê de, bû sedem ku her yek li wan piştgirîya grûpeke "proxy" di wan nakokiyan de bike. Îran, Rûsîye û Hizbullah a Lubnanê bo parastina rejîma Esed ketin eniya wê rejîmê û bi hemû îmkanên xwe yên madî û merivî xwestin wê rejîmê biparêzin.

Çend welatên rojavayî, di nav wan de Amerîka, Brîtanya û Fransa, piştgirîya xwe ji bo opozîsyona rejîma Esed re ragihandin. Wan bikaranîna tundûtûjiyê li dijî xwepêşanderan ji aliyê Esed ve rexne kirin û daxwaza reformên siyasî kirin. Her ku pevçûn zêde bûn, van welatan dest bi piştgirîkirina hin komên serhildêr kirin. Ev piştgirî weke hewldaneke jinavbirina rejîma Esed hat şîrovekirin, lê di heman demê de ew piştgirî parçebûn û armancên cuda yên aktorên rojavayî dida nîşandan. Ew welat tevî lawazkirina rejîma Esed de bûn, lê armanca wan ne hilweşîna wê rejîmê bû. Li ber ku ew li wê yekê ditirsiyan ku hilweşîna rejîmê bibe sedemê çêbûna walahiya desthilatdariyê û ew yek jî mecala bêhtir bide grûpên terorîst ku Sûryeyê bikin meydana çalakiyên xwe. Ji ber wê yekê jî, xêncî ku li serdema serkomariya Obama de, DYA qet bas li nehêlana rejîma Esed nekir û tenê bi sedema şerê tew DAÎŞê hindek hêzên xwe şandin bo navçeyên Rojava a Kurdistanê ku di şerê hember DAIŞê de piştgiriya kurdan bikin. Lê welatên wek Tirkiye, Qeter, Erebistan û grûpên Filistinî wek Hemas bi sedema dijberiya Îranê, sedemên olî û bilindkirina asta bandora xwe di herêmê de piştgiriya hindek grûpên opozisyonê kirin. Di nawa wan welatan de Tirkiyê bi sedema hebûna hizra faşîstî-olî û dijberiya kurdan li Rojavayê Kurdistanê bêhtir cehd kir ku bi piştgiriya hindek grûpên opozisiyonê û bi xasma HTŞê (Cibhet Al-nusra berê) rolek mezintir li pêvajoya nakokiyên Sûryeyê de bilîze.

Piştî hilweşîna rejîma Esed rewş dixûye ku grûpên nêzîk li Tirkiye destê herî bilind li Sûryeyê hene. Eger çi hilweşîna rejîma dîktator a Esed bo kurdan û hemû xelkê Sûryeyê dikarî baş be, lê bandora Tirkiyeyê li ser wan grûpên xwedî bandor û dijminatiya Tirkiye bi kurdan re dikare siberojek nexweş bo kurdan bîne pêş. Hêvîdar im ku wisa jê neyê ku "piştî bê dîn, bê îman" hatibe. Tê gotin ku alternatîva şer û çekê, demokrasîye. Eger sîstemek demokratîk li Sûryeyê bê awakirin, dikare azadiyê bi awayeke relatîv bo hemû aliyekê desteber bike. Lê aktorên xêrnexwaz nahêlin ku xelk li Sûryeyê bi xwe biryarê li ser çarenivîsa xwe bidin. Neku ew modela ku kurdan bo desthilatdariyê li Rojava çêkiriye, dikarî bibe modelek baş bo hemû Sûriyeyê. Li ber ku modêlekî başe demokrasiyê li Rojhelata navîn de bû.

Hilweşîna rejîma Esed tenê nayê wê wateyê ku Îranê dewletek dost ji dest daye. Rejîma terorîstperwer a Îranê bi salan Sûriye wek rêka nifûza xwe di Rojhilata Navîn de didît û bi milyardan dolar û hezaran kes kire qurbanî bo parastina rejîma Esed. Rejîma Esed tenê dewleta Erebî bû ku li serdema şerê Îran û Îraqê de piştgiriya rejîma Îranê kir, derfet da rejîmê ku çek û sîlahan li rêka erdê ve bo Hizbullah û Hemasê bişîne û dijberiya Îsraîlê bike. Sîstema bergiriya esmanî a Sûriyeyê kospa ser rêya Îsraîlê bû bo hêriş li ser Îranê.

Karbidestên Îranê bi caran anîne ziman ku eger li Sûriyeyê berxwedanê nekin, yê şer bikeve deriyê wan û dibe li Îranê de hember dijminên xwe şer bikin. Niha ew rîsê ku wan bi salan ristî, dîsan bûye hirî. Ew hemû sermaye û zehmetî bi valahî çon. Ewê yekê dest û bazikên rejîmê qetandin û nikare wek caran karê têkderane bike û bi wê hindê bacê li welatên din bistîne. Hizbullah û Hemas jî ku piştî şerê wê daviyê tew Îsraîl ku zor lawaz bûne, dixûye ku yê hîn lawaztir bin. Lawazbûna wan rêkxistinên terorîstî di berjewendiyên merivahiyê de ye. Lê eger Erdoxan grûpên xiraptir neke hakimê Sûryeyê. Em dibe binihêrin û bizanin ka desthilatdariya nû a Sûriyeyê yê çawa bê dîzaynkirin.

Pêş hilweşîna rejîma Esed, rejîma Îranê pirsgirêkên mezin yê ewlehiyê bo cîhanê pêk dianîn. Niha Îran weke çivîkeke pencoyîkirî lêhatiye ku per û basikên xwe ji dest dane û nikare bifire. Ji ber wê yekê e jî ku ew rejîm cehd dike bi pîtandina Oraniyomê û çêkirina çekên navikî, hebûna xwe garantî bike. Hemû rejîmên dîktator ji xwe wek yek difikirin.

Ew hêza leşkerî li xelkê girîngtir dibînin û pêştgiriyê didinê. Niha hindek karbidestên wê rejîmê, piştî hilweşîna rejîma Esed, ew rastiya bo wan derketiye û bas li hêlana xelkê ji destê xwe de û bo parastina rejîmê dikin. Bo mînak demek berê Muhemmed Cevad Zerîf, muşavirê serkomarê Îranê bas li wê yekê dikir ku ew di qada leşkerî de nikarin rikeberiya Amrîka bikin û hevceyîya wan bi xelkê heye. Lê niha gelek dereng bûye. Hilweşîna rejîma Esed pêvajoya hilweşîna rejîma Îranê lezgîntir kiriye.

Armanca rejîmên dagirker, şovînîst û olperestên paşvero ne çareseriya merivane ye bo pirsan. HTŞ ji aliyê dîspoteke wek Erdoxan û rejîma faşîstan we tê piştgirî kirin. Eger ew hişmendiya xwe neguherin û bi awayek dadperwerane nefikirin, ewê jî li ser rêça rejîma Esed berdewam bin. Lê neteweya kurd li dîrokê de daye nîşandan ku serê xwe hember zilmê natevîne. Hêvîdar im ku ew li dîrokê dersê werbigrin û carek din kurdan neceribînin. Dijayetiya wan bi kurdan re, dijayetiye tevî aydalojiya wan bi xwe. Eger baveriya wan bi wê yekê heye ku xwedê kurd afirandine, dijberiya wan bi kurdan re û neheqî derheq kurdan, dijayetiya tewî xwedê û baveriya wan bi xwe ye. Ew yeka her wisa dijî mafê merivan û hemû prensîp û nirxên exlaqî û însanî e.

Dibe hemû aliyek bizanibin ku bo jiyana bi hev re, me pêwîstî bi saziyên hevpar hene, ne nirxên hevpar. Kurdan daye eyankirin ku neteweyek dadperwer û azadîxwaz e. Bo pêkvejiyanê kes hindî kurdan fîdakar û bi merhemet nîn e. Hêvîdar im ku HTŞ bi pîlanên nehezan nexape. Ew yek ne di berjevendiya wan de ye û ne jî ya xelkê Sûriyeyê. Bo ku kurd li Rojava bikarin baştir destkevtên xwe biparêzin, nêzîkbûn û avakirina hevbendiyek Kurdistanî li wî parçeya Kurdistanê de pêdivî ye. Em dibe çavnihêr bin û bizanin ka rojên pêşiya me yê çi bi xwe re bînin.



# Divê em şaştiyên xwe yên sala 58`an dubare nekin



**N. Kawe Ahengerî**
**W. Hesen Mukerem**



Sala 58`an ji bo Kurdan saleke diyarker bû, lê mixabin di encanê de ji bo Kurdan salên reş bi dû xwe de anîn.

Şerekî newekhev û bi xwîn ku ev 45 sal in rewşekî dijvar bo Kurdan bi dû xwe de aniye.

Dijberên rêjîma Pehlewî çiqas amadeyî hebûn, dijberên Xamineyî jî ev qasî amade ne.

Pirsgirêka Kurd di navbera rejîm û opozisyonê de bê çareserî maye. Loma em kurdên Îranê dîsa di rewşeke wiha de ne.

Her çend faktorên di qada siyasî de ji wê demê zêdetir û cudatir bin jî, di warê çarenivîsê de, em li Rojhilat dîsa nêzîk dibin.

Ji bo zêdetir analîzkirina vê yekê, em ji du têgehên ewlekarî û siyasetê dest pê bikin.

### Ewlekarî û siyaset

Zêdetir li ser çarenivîs, ewlehiyê, ne siyasetê ye.

Di sala 58`an de, tenê du kes, Dr.Qasimlo û Şêx Ezedînî Huseynî, ji aliyê siyasî ve ji piraniya siyasetmedarên ku li Tehranê dijîn bilindtir bûn.



Dikaribûn xwe bi paş ve bikşînin ser Kurdan. Ewlekarî bi çavkanî û hêzê dikare were peyda kirin ku hêza leşkerî rawestînin û ew dikare were kirin. Ji leşkeriyê bigire heta medya û perwerdeyê.

Tehranê bi desteserkirina hêzên leşkerî û serdestiya li ser kontrol û muameleya li ser neteweyên erdnîgariya Îranê karîbû hejimûnyaya xwe li ser Îranê bide sepandin.

Dema ku hûn li ser ewlehiyê serdest bin, hûn ê zêdetir bandorê li ser rewşa siyasî bikin.

Ewlekariya siyasetê diyar dike, ne berovajî vê yekê, ev rastiyek e, eger kurd nexwazin li Îranê bimînin, ev rewş bi tevahî cûda ye û ti eleqeya xwe bi vê gotarê re nîne ger kurd bi dilxwazî yan bi zorê li Îranê bimînin,ew hebûna kurdan li Tehranê ye.

Di demsala Havînê de partiyên rojhilatî ne tenê ji Tehranê bi temamî derketin, bajar û gundên Kurdistanê jî terikandin û berê xwe dan çiyayan. Ji aliyê ewlehiyê ve ew şaştiyeke kujer bû, ji ber vê yekê ez bawer nakim ku dubare bibe.
Dema ku em behsa ewlehiyê dikin, mebesta me ew e ku hejmûnî û hêza komkirî ya partiya desthilatdar ku dikare Îranê kontrol bike û bi vî awayî rojeva xwe ya siyasî pêş bixe, têk bibe.

Ji ber vê yekê hevsengiya hêzan girîng e ku destên saziyên siyasî yên Kurd li Îranê ji bo her planên wan veke. Ji bo vê jî hin rê û cihên ku nêzî kurdan dibin hene.

ji bo cîbicîkirina vê planê, ango Kirmaşanê.

Bi qasî ku Kirmaşan dikare bandorê li çarenivîsa siyasî ya Kurd bike di warê ewlekarî de, bajarên din ên Kurdan jî nikarin bibin xwediyê vê giranî û bandorê.

Lê belê di warê rêxistinî û ewlehiyê de jî divê Kurd li Tehranê hebûna xwe hebe.

### Parastina Kurdistanê

Ji ber ku li Îranê bi giştî û li Tehranê bi taybetî ne sazîbûna demokrasiyê wek prensîb e, hindek ne mentiqî ye ku mirov çavnhêrî Tehranê bibe ku bi awayekî demokratîk bi pirsgirêka Kurd re mijûl bibe.

Ji ber vê yekê nîqaşa min di çarçoveya demokratîkbûn û federalkirina Îranê de cih nagire.

Bi kêmanî hevsalên min di warê parastina Kurdistanê de li ser bingeha demokrasiyê pêşketineke baş nabînin. J

i ber wê jî em neçar in ku di rewşa guhertina Îranê de li çarenivîsa kurdan bi hevsengiya hêzên leşkerî û ewlehiyê binêrin.

### gotina dawî

Şerê ku li Rojhilata Navîn dest pê kiriye û zû bi dawî nabe, ji xeynî Sûriyê li welatên din jî belav bûye.

Li gorî nêrîna nivîskar, ramana rênîşander a rewşa niha ya Rojhilata Navîn dozek ewlehiyê ye.

Bi gotineke din, ya îro li Rojhilata Navîn qebareya siyasetê diyar dike, teoriya ewlekarî-leşkerî ye, ne tiştekî din.

Di rastiyê de projeya demokratîkbûn û laîkkirina herêmê bi teoriya ewlehiyê tê birêvebirin.

Ji ber vê yekê hêza me ya ewlekarî û leşkerî ya li ser xakê mezinahî û şeklê paşeroja me ya siyasî ji nû ve dinivîse.

Ji ber vê yekê, di egera guhertina Îranê de, ji bo me kurdan, ew hêza me ye ku em di warê ewlehiyê de bilîzin ku dê paşeroja me ji nû ve binivîsîne, ne heqî û dîrokîbûna me ye.

# Şehîdên me ji me re dibêjin ‘bi hişmendîyeke neteweyî, hevkarîyên xwe pêk bînin



**N. Mistefa Ozçelîk**
**Serokê Giştî yê (PWK)**



Di 13emîn salvegera qetlîama Roboskê de, şehîdên Roboskê, li vê qetlîama ku Dewleta Tirkîyeyê kirîye ya ku hîna jî weke ‘’faîlî maçhûl’’ maye temaşe dikin.

Dewleta Tirkîyeyê, hem kiryardarê vê qetlîamê ye, hem hîna jî qurbanîyên qetlîamê sûçdar dike.

Şehîdên Roboskê û wîjdanê mirovahîyê, bi awayekî ecêb mayî temaşeyî wê cîhana ku li himberî vê qetlîamê hîna jî weke kerr û koran tevdigerin dike.

Belê, şehîdên Robozkê li me, li yên dibêjin ‘’Em Qetlîama Roboskê ji bîr nakin’’ temaşe dikin.

Şehîdên Roboskê, li gotinên me yên ‘’Em Şêx Seîd, Seyîd Riza, Qazî Mihemed, Melle Mustafa Barzanî, Helebçe û Enfalê ji bîr nakin’’ guhdar dikin.

Şehîdên Roboskê li me, li yên dibêjin ‘’Em şehîdên xwe ji bîr nakin’’, lê dîsa jî her roj bi dehan kesan şehîd didin temaşe dikin.

Şehîdên Roboskê, li ewên ku bi ezeztîya xwe, bi perçebûn û bi jihevketina xwe, dibin sebep ku rêya azadîyê zehemettir û dirêjtir bibe temaşe dikin.

Şehîdên Roboskê, li ewên ku bi ezeztîya xwe, bi perçebûn û bi jihevketina xwe, berhemên hemû fedekarî, şehadet û berxwedanên gelê me lawaz dikin temaşe dikin.

Ewên ku ji bo yekitîyeke neteweyî, sekneke neteweyî, hişmendîyeke neteweyî çênebe û nekemile, çi ji destên wan tê dikin; belê, şehîdên Roboskê li wan temaşe dikin.

Başê, çi ji me dixwazin, çi ji me dipên şehîdên Robozkê?

Şehîdên Roboskê, ji me re dibêjin: Yên di nav partîyekê de dikarin bibin yek, bila bibin yek; yên nikarin bibin yek, bila hevkarî û tifaqan bikin, yên nikarin hevkarîyan bikin bila di nav dan û stendin û dîyalogan de bin, yên nikarin dîyalogan jî bimeşînin, bila dijminatîya hev nekin.

Şehîdên Roboskê, li Bakurê Kurdistanê li benda partîyeke xurt, girseyî, milî, demokrat in; li benda tifaqeke stratejîk ya netewî û demokratîk ya xurt in; li benda wê yekê ne ku li ser daxwazên acîl yên miletê Kurd, hevkarîyeke berfireh pêk were û bi vê hevkarîyê hemû alîyên kurdan bibin teref û mixatabên Dewleta Tirkîyeyê.

Şehîdên Roboskê, li Başûrê Kurdistanê li benda wê yekê ne ku bi yekrêzîya gelê me, hikûmeteke xurt ya yekgirtî, milî, niştimanî bê ava kirin û ev hikûmet bikaribe yekitîya dezgehên pêşmerge, ewlekarî, aborî, dîplomasî, rêvebirî yên Herêma Kurdistanê pêk bîne, destkeftîyên federalî biparêze û pêşde bibe û li gel Bexdayê, li gel hemû dewletan wek yek alîyekî tevbigerin, bibin mixetab.

Şehîdên Roboskê, li Rojavayê Kurdistanê li benda wê yekê ne ku li ser hişmendîya Mitabaqata Dihokê, li gorî şerdên îroyîn, îdareyeke hevbeş ya eskerî, aborî, sîyasî, dîplomasî ya hemû partîyên Kurdan bê ava kirin; li benda wê yekê ne ku bi yekgirtineke netewî, rê li statuyeke sîyasî ya netewî bê vekirin.

Li benda wê yekê ne ku hemû alîyên kurdan li gel rêvebirîya Şamê, li gel hemû dewletan, bi yek dengî û yek helwestî wek terefê kurdî bibin mixetab.

Şehîdên Roboskê dibêjin, mimkune ku di encama van pêşhateyên li Rojhilata Nêzîk û Rojhilata Navîn, hinek firsendên mezin bêne ber derîyê xuşk û birayên me yên li Rojhilatê Kurdistanê.

Ji bo ku bikaribin van firsendan baş bikar bînin û ji bo gelê me destkeftinan bidest bixin, divê hêzên neteweyî yên li Rojhilatê Kurdistanê bi awayekî berfireh, hevkarî û tifaqên xwe yên neteweyî, demokratîk pêk bînin.

Belê, Şehîdên Roboskê û hemû şehîdên me dibêjin, îro ji her demê zêdetir pêwîstî bi wê yekê heye ku li ser hişmendîya neteweyî, demokratîk, li her perçeyekî Kurdistanê hevkarî û tifaq bêne hûnadin; di nava hêzên her çar perçeyên Kurdistanê û dîasporayê de jî, tor û mekanîzmayeke ku bikaribe koordînasyon, hemahengî, dîyalog, dan û stendin, lihevxwedîderketin, piştgirî, alîkarî, şêwra navxweyî, bi hev re dîyar kirina fikir û helwestên hevbeş bihûne heye.

Em di wê bawerî û hêvîyê de ne ku Qetlîama Roboskê û qesas û berpirsên wê rojekê dê bêne darizandin.

Belê, me qetlîama Roboskê ya ku di şeva 28.12.2011ê de, ji alîyê Dewleta Tirkîyeyê ve hate li dar xistin ji bîr nekirîye, emê ji bîr nekin.

Em vê qetlîamê şermezar dikin.

Ji bo qetlîmên nû rûnedin, pêwîstîya me bi hevgirtin, hevkarî, tifaqên neteweyî heye, pêwîstîya me bi welatekî azad û di welatê xwe yê azad de bi jiyaneke adil û azad heye.

Em şehîdên Roboskê û hemû şehîdên xwe bi rêzdarî bi bîr tînin, ruhê wan şad, cîhê wan bihuşt be.

Em bangî Netewên Yekbûyî, Konseya Ewrûpayê, Mehkemeya Mafê Mirovan ya Ewropayê û dezgehên peywendîdar yên cîhanê dikin ku ji bo qesas û berpirsên vê qetlîamê bêne darizandin, gavên pêwîstî pê hene bavêjin.

## Nerîna



**"Ahmed Turk":**

**" Di duyemîn an jî sêyemîn serdana Rêberê PKKyê Abdullah Ocalan de eger heye banga çekdanînê bê kirin"**



**"Annalena Baerbock":**

**"Divê garantiyên ewlekarî yên pêbawer ji bo Kurdên Sûriyê hebin"**



**"Jean Noel Barrot":**

**"Divê çareseriya siyasî ji hevpeymanên Fransayê re were dîtin û hevpeymanên Fransayê yên li Sûriyeyê Kurd in"**



**"Volodymyr Zelenskyy " :**

**"Trump dikare di vî şerî de diyarker be, û şiyana wî heye ku Pûtîn rawestîne, an jî alîkariya me bike ku Pûtîn rawestîne"**

# Ev 3 Rêbendan in ku Serhildana Jînayê didome!



**N. Eskender Ceiferî**



Ji destpêka şoreşa Jînayê ve heya niha çendîn caran xelkê Rojhilat rêfrandoma xwe bi rêve biriye.

Hem bi gireva giştî, hem bi serhildanê, hem bi pêşwaziya Newrozê û niha jî dê bi pêşwaziya salvegera damezrandina Komara Kurdistanê xelk, şehîdên Komarê û şehîdên serhildana Jînayê li ser gorên şehîdan bi bîr bîne û dîsa rêfrandoma Rojhilat birêve biçe.

Rêjîma dagirkar a faşîstên Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heya dema ku partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, rêjîma Komara Îslamî jî nîgeran e.

Rêbendan bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek ji wan desthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine rêûresmên ji bo pêşwaziya 2ê Rêbendanê salvegera damezrandina Komara Kurdistanê bi rengekî hêja were pêşwazîkirin.

Rojhilatê Kurdistanê jî parek ji vî welatê birîndar e. Rêjîma dagirkar a niha jî, weke rêjîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakiyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Rast e ku Komara Kurdistanê bi pêşengiya Hizba Dêmokrat hat avakirin lê aliyên cuda yên siyasî yên Rojhilat, pêşwaziya 2ê Rêbendanê dikin. Ev pêşwaziya Rêbendanê jî weke pêşwaziya Newrozê li ser gorên şehîdên serhildana Jînayê ye.

Belkî ev, zengila metirsiyê be ji rêjîma Îranê re. Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partî û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn.

Ji destpêka şoreşa Jînayê ve her sal tevgereke mezin di nava Sipaha dagirkar a Pasdarên Îranê de çê dibe. Ew ditirsin vê carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî ji nava Sipahê amaje dikin ku bajarên Xurasanê, Sine, Îmam, Urmiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke ya hêzên wê rêxistina têrorîst.

Bi vî rengî ku endamên Sipahê, di nava xelkê sivîl de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku basa 2ê Rêbendanê ya aliyên Kurdî li ser gorên şehîdên serhildana Jînayê bike, bê girtin.

Ji xeynî tevgerên Sipaha Pasdaran, selefî jî li hemberî netewegiran têne çalakkirin. Plana herî dawî ya rêjîma Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku neteweparêziya Kurdî di landikê de bifetisînin.

Li gor zanyariyên çavkaniyeke veşartî ya saziya Îstixbarat angu Îtilaata Îranê, heke tevlîhevî yan jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilatê mezintir be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Îsal jî Rêbendan, Rêbendana Jînayê ye. Xelk hem Komara Kurdistanê bi bîr tîne û hem jî rêzê li şehîdên serhildana Jînayê digire.

Her Rêbendanek, ji bo Kurdan rêfrandûmeke serxwebûnê ye ku li dijî rêjîma dagirkar a faşîstên Tehranê li hemû navçe, gund û bajaran pêk tê.

Aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin desthilata dagirkariya niha de, ti hilbijartineke dêmokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim hilbijartinê baykot dikin.

Li gor wan, hertim Kurd biryara xwe li dijî dagirker distînin û soza xwe bi riya şehîd û cangoriyên niştiman re nû dikin. Îsal jî ewê bi pêşwaziya xwe li 2ê Rêbendanê li ser gorên şehîdên serhildana Jînayê soza xwe bi cangoriyên Kurdistanê re nû bikin.

Ev 3 sal in ku serhildana Jînayê didome. Jîna Emînî ji aliyê Serfermandariya polîsên Îranê, ku serperiştiya cîbicîkirina yasayên bi navê hicabê ye, bi tawana pabendnebûna hicaba xwe bi pîvanên rêjîma dagirkar ve hate girtin.

Polîsên Îranê got ew ji nişkan ve li binkeyekî hêzên rêjîmê de têk çû, li wir ket erdê û piştî 2 rojan di komayê de mir.

Lê ew ne rsdt e û xizm û kesên Jîna Emînî li ber çavan dîtibûn ku ew rastî lêdanê hatibû. Wan gotin ew hat lêdan û serê wê li kêleka otombîleke polîs ket, ku bû sedem ku Jîna şehîd bibe.

Ji wê demê ve serhildanê dest pê kir û di rêûresmên taybet ên weke 2ê Rêbendanê de jî bi gurrtir dibe.



# Daxuyanî bi hilkefta koça dawiya çîroknivîsê mezinê Kurd, Mensûr Yaqûtî



Mixabin êwara rêja Şemî 8ê Beframnbara 1403 a Rojî, Mensûr Yaqûtî, naskirî bi Gulbaxî, nivîskarê navdarê Kurd, bi sedema nexweşiya şêrpencê li bajarê Kirmaşanê de koça dawiyê kir.

Xwedêjêrazî Yaqûtî jidayêkbûyê sala 1327 a rojî li gundê "Kêwenan"ê ser bi bajarê Sunqurê li Kirmaşanê ye û qonaxên xwendinê li bajarê Kirmaşanê de bi dawî anî û li xwendingehên wî bajarî de wane bi xwendevanan gotine, navbirî helbestvanekî rexnegir ê berçav ê Rojhilatê Kurdistanê ye.

Xwedêjêrazî "Mensûr Yaqûtî", yek ji wan nivîskarên navdar e ku nasnameya "Çixofê Îranê" pê hatiye bexşîn. "Mensûr Yaqûtî", diçe rêza wan nîskarên ku li wêjeya cîhanê de bi nivîskarên wêjeya kêmîne hatine navdêrkirin ku bi sedemên siyasî, neçar bi nivîsîn bi zimanekî bilî zimanê xwe dibin, lê xem û azara gelê xwe dinivîsin û ji êş û jana ax û xelkê xwe ji bîr nakin. Lewma "Mensûr Yaqûtî" bi zimanê farsî û li naveroka çîrok û romanên xwe de awirek ji xelk û gelê xwe daye.

Xwedêjêrazî "Mensûr Yaqûtî", ku li serdema rêjîma paşayetî de jî bi sedema dîtingeh û nivîsên xwe rastî azar û îşkenceyan hatibû, li sala 1359 a Rojî û piştî şoreşa gelan li Îranê, bê ku ti skalayek li ser hebe, ji kar hate derxistin û piştre tevî karê nivîskariyê, kedkarî jî dikir.

Beşek ji berhemên "Mensûr Yaqûtî", bi zimanê Kurdî hatine vergêrandin ku berhema "Çirayek li ser Mayînko" navdartirîn a wan berheman e.

Berhemên din ên vî nivîskarî ev in: Awazê Kûh, Dastanhayê Ahû Derê, qissêhay Zagros, Ayîn Yarsan der esatîrê Qomê Kurd, Hemasê Babek Xuremdîn, Xerçengê Bolend Perwaz, Dêhqanan, Çiraxî ber ferazê Madiyankûh, Efsanêîhayî ez dêhnişînanê Kurd, golê Xas, Pacûş, Merdanê Ferda, Sal por moxatêrê, Ba Beşêhayê Dêhê Xodêman, Zexm, Dirextê Xoşk û Baxê Por Gol.

Hêjayê gotinê ye ku Xwedêjêrazî "Mensûr Yaqûtî", bi rêya têkoşerên teşkîlata Hizba Dêmokrat li navxweyê welat, pêwendiyeke dostane digel Hizba Dêmokrat hebû ku hertim bi çavê rêz û pêzanînê, mêzeyî dîtingeh û nivîsên wî dikir.

Navenda Ragihandin a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta koça dawî ya xwedêjêrazî "Mensûr Yaqûtî", sersaxiyê dibêje hemû wêjezan û nivîskarên pêbendê Kurd û malbata mezîn a Yaqûtî û xwe bi hevparê xema wan dizane.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Ragihandin**

**9ê Brfranbara 1403 a Rojî di hemberî 29ê Kanûna duyem a 2024**

# Gotûbêja li ser danasîna çar kitêbên dawî ji berhem û nivîsa Seîd Veroj

## 2. Memduh Selîmê Wanî (1876-1887)



**N. Seîd Veroj**

Memduh Selîm, di dawîya sala 1887an de li Wanê ji dayik bûye. Kurê Cemîl Beg e, wî, li Wanê dest bi xwendina xwe ya seretayî kirîye û paşê "li Îstenbulê Mekteb-î Mulkîye xwendîye. Memduh Selîm Begî, kadroyekî herî çalak û navdarê tevgera rewşenbîrî û sîyasî ya Kurdistanê ye ji destpêkê ta nîvê sedsala 20an.

Xebata wî ya di nav rêxistinên kurdan de, li Îstenbulê di nav rêzên Cemîyeta Hêvî (Komela Hêvî) de dest pê kirîye. Komela Hêvî ya Xwendekarên Kurd, di 27ê Temûza 1328an (9ê Tebaxa 1912an) de li Îstenbulê hatîye damezrandin û Emer Cemîl Paşa heta kongreyê muweqeten ji bo sekreterîya Komela Hêvî hatîye wezîfedarkirin.

Cemîyeta Hêvî, piştî damezrandinê, di çarçoveya armanca komelê de dest bi weşandina kovara Rojî Kurd dike. Rojî Kurd, ji mehê carekî bi zimanê kurdîturkî hatîye weşandin û li ser hev çar jimar hatine çapkirin û belavkirin. Piştî çapkirina çar jimaran, weşana Rojî Kurd ji alîyê desthilatdarîya sîaysî ya wê demê ve hatîye rawestandin. Piştî rawestandina weşana Rojî Kurd, li şûna wê, bi navê Hetawî Kurd, kovareke nû hatîye weşandin. Di vê demê de, katibê umûmî yê "Cemîyeta Hêvî ya Feqehên Kurd" Memduh Selîm Beg e û herweha ew di nav lijneya nivîskaran de ye. Di berîya destpêka Şerê Giştî yê Cîhanê de, Memduh Selîm li ser rewş û zixtên wê demê weha dibêje: "Hemû ciwanên di nav Cemîyeta Hêvî de, ji ber lihevanîna sebebekî mehkeme kirine. … mesûlê cemîyetê dane mehkema Dîwana Herbê, bi mehan di hepisxaneyê de perîşan kirine."

Piştî xelasbûna Şerê Giştî yê Cîhanê, bi serokatîya Seyîd Abdulqadirê Nehrî, Cemîyeta Tealîya Kurdistanê (CTK) hatîye damezrandin. Memdûh Selîm Begî, yek ji endamê çalak û rêvebirê cemîyetê bû. Bi girêdayî CTKê kovara Jîn hatîye çapkirin, mesûlê kovarê Hemzeyê Muksî bû û ew jî yek ji rêvebir û nivîskarê kovarê bû. 20 jimarên kovara Jîn (Jimara 20an: 4ê Hezîrana 1335an/4ê Hezîrana 1919an), di bin berpirsyarîya Hemzeyê Muksî de hatine çapkirin û jimara 21 û ji wê pê ve jî (jimara 21an: 18 Hezîrana 1335an/18ê Hezîrana 1919) Memduh Selîm Beg bûye berpirsyarê kovarê. Li gor agahîya me ya îro, 36 jimarên kovara Jîn hatine çapkirin.

Dema ku CTKê parçe bûye, wî, ligel koma serxwebûnxwaz kar kirîye û tevlî Cemîyeta Teşkîlatê Îctimaîye ya Kurd bûye. Herweha ew bi tevî Necmeddîn Huseynî, Kemal Fewzî û Babanzade Ezîz Beg û yên din damezrêner û rêvebirê Partîya Demokrata Kurd û Partîya Milleta Kurd bû. Wekî gelek rewşenbîr û sîyasetmedarên kurd ew jî mecbûr ma ku sala 1922yê terka Îstenbolê bike û biçe Qahîreya paytexta Misrê û ji wir ve jî derbasê Libnan û Sûriyeyê dibe.

Ji têkçûna tevgera neteweyî ya sala 1925an şûn ve, gelek Kurdên rewşenbîr û kadroyên sîyasî yên ku derbasê dewletên Awrûpî, Misir, Iraq, Surîye û Beyrûdê bûn, xebata xwe ya rewşenbîrî û sîyasî li wê derê dewam kirin. Ji vana yek jî Memduh Selîm Beg bû. Bi hewldan û serkêşîya Memduh Selîm Begî, ji bo piştgirîya berdewamî ya grubên şoreşger ên tevgera rizgarîya Kurdistanê, pêdivîya ji nû ve rêxistinbûnê hatîye rojevê. Di encama vê nêrîn û lêgerînê de, bi gelek grubên sîyasî yên kurd û şexsîyetên sîyasî yên hundir û dervayê Kurdistanê re têkilî û hevdîtin çêbûne. Herweha bi hin gurubên mixalif ên Ermen re jî têkilî û hevdîtinên piştevanîyê hatine kirin.


Di dawîya vê xebatê de, di roja 5ê Cotmeha (Çirîya Pêşîn) 1927an da li Beyrûdê bi beşdarbûna panzdeh kesan, bi navê Xoybûnê rêxistineke nû hatîye damezrandin û Celadet Bedirxan jî wek serokê pêşî yê vê rêxistinê hatîye hilbijartin. Rêxistina Xoybûnê, bi yekgirtina çend grubên sîyasî yên wê demê pêk hatibû. Hereketa Agirî bi rêvebirîya sîyasî ya Xoybûnê hatîye pêkanîn û Memduh Selîm Beg bi nasnava "Îskender" di vê pêvajoyê de wezîfeyên girîng hildaye ser milê xwe. Di vê hengameyê de Xoybûnê, di derbarê rewşa miletê Kurd de ji bo raya giştî ya hundir û derva gelek beyanname çapkirine û belavkirine. Piştî ku hereketa Agirî bi ser neket, Memduh Selîm bi giranî xebatên rewşenbîrî re mijûl bûye û demeke dirêj di Lîseya Antaqyayê de mamosteyî kirîye.

Memduh Selîm Begî; bi zimanê kurdî, erebî, fransizî û ermenî zanîbû. Di kovarên Jîn, Kurdistan û Dîyarîyî Kurdistan de bi navê Memduh Selîm, Memduh Selîm Begî, Kurd Wanî 14 meqaleyên wî hatine belavkirin. Ew ne tenê nivîskar bû, jîyana xwe jî bexşê têkoşîna rêxistinbûn û serxwebûna Kurdistanê kiribû. Lewma dibêje: "Hîç neteweyek nekare hêvî û daxwazên xwe yên pêşkevtinê bi bê rêxistinê û hîç rêxistinek nekare bi bê netewe bernameya xwe pêk bîne."

Piştî têkoşîneke nîv esrî, salên dawî yên jîyana wî di nav problemên nexweşî û tengasî de derbas bûne. Wî di roja 27ê Tîrmeha 1976an de li Şamê koça dawî kirîye.

Memduh Selîm dema ku di Lîseya Antaqyayê de mamoste bû, ji şagirtên wî yek jî Cemîl Merîç bû, ew di nivîseke xwe de li ser wî weha dibêje: Memdûh Selîm; Ji Mekteba Mulkîyeyê mezûn bûbû, ew mekteblîyekî Awrupayî yê Meşrutîyeta Duyem bû, ji rahleyê tedrîsata Abdullah Cevdet derbas bûbû. Ew merivekî metîn, çetîn û ji pêdivîyê zêdetir ciddî bû.

Ev xebata ber destê we; çîroka têkoşîn û jîyana rewşenbîr û sîyasetmedarekî Kurdê sedsala 20an e, helqeyek nû ye ji rêzepirtûkên bîyografya navdarên Kurd ku nêzîkê diwazdeh sal in li ser dixebitim.



# BI AQLÊ KURDÎ, BI HIŞMENDÎYA NETEWÎ RÊ LI ZEBANÎYAN ASÊ BIKIN



N. Cano Amedî



Di pêvajoya îroyin de em dibinin ku civatên bi karekterê talan û hovîtîyê hatine mobîlîze kirin ji pîvanên mirovahî derdikevin û şêweyekî hov agirê barbarîyê geş dikin û rê li ber trajedi û travmayên dîrokî û însanî vedikin. Hêzên desthilatdar bi piştgirî û hêvîyên tiştekî bi dest bixe civatê ji bo berjewendîyên xwe bi kar tîne. Ji bo wî jî, civatên paşdemayî û yên xizan cîhê laboratuvarên îdeolojî û dîktatorîyê ye. Proje û tatbîqatên pratîkî bi giranî li wan deran, li wan hereman bi kar tînin.

Mirovên ji rastîya civaka xwe dûr bikeve, ji pêşbinî û zanyarîya civakî bêpar be, her tim jiyanê reş û sipî dibine. Di nav demê de dişibin dijberê xwe û di gêzgerînkên (labirent) kor de bi kulmên dijmînatîyê êrîşî sîya xwe dikin. Hêza xwe ji nezanî û bêpîvanîya xwe digirin.

Pirî caran li hemberî rewşên bi vî rengî gotinên pêşîyan tê bîra mirov: “Bibe xulamê zana nebe mîrê nezana!” Lewra mirovên nezan bi berçavkên hespan li dinê dinhêrin, ji bilî xwe li kesî gohdar nakin. Mirov çiqas ji wan kesên xwedî fikirên sabît dûr bisekine, xwe ji wan biparêze, ez bawerim wê mirov ewqas aram û şad be.

Pirî caran ez rastî gilî û gazinên ku ji alîyê xizim û dostên min ve tê kirin rûbirû dibim. Dibêjin: “Tu kes naxwîne, naşopîne û naxwaze konfora xwe xirab bike, tu çima dinivîsîne, di peyivî an tevdigerî?” Ez têdigihîjim ku peyamên wan tê çi watê? Salên derbasbûyî, pêvajoya zîndanbûyinê û zehmetîyên hevbeş ku me bi hevre kişandîye, bi wan re demsalên xof û tirsê geşdike.

Lê divê baş bê zanîn ku ez ne ji bo pejirandinê, ne jî ji bo kêfxweşîya hinekan tevnagerim. Ez baş dizanim ku doza netewî, pêwîstîya bicîhanîna erk û berpirsîyarîya millî li ser herkesî ferz dike. Erk û hestên me yên mirovahî, ûjdanî, ehlaqî û hûqûqî rîya têkoşînê û xebatê radixe ber me. Eger em dilsozên doza milletê xwe bin, divê em bê tirs û bê şik erkê xwe yên netewî bi cîh bînin. Li dijî neheqî û zilmê pejirandina helwest girtinê yek ji wan erkên mirovîyê ye!

Bêguman, di van 40 salên dawî de ji ber şer û wêrankarîya sîyaseta îdeolojîk û kemînî, ji ber bêalternatîfîya netewî û qelsbûna hişmendîya kurdewarî, civata Kurd di bin bandora desthilatdarîya otoriter de dîl ketîye; Hatiye dorpeç kirin û bi hêvîya berjewendîyên rojane xwe radestî pêvajoya kedîkirinê kirîye. Ev dêrûnîya hanê roj bi roj ji alîyê hêzên leflefokê şer û narkotîk ve tê geş kirin. Em dibînin ku pirî caran ji bo berjewendîyên rojane, ji bo menfeet û kursîyekî gemarî, helwestên hatine nîşandan, tu feydeyek, tu pêşketinek an tu guhertinek bi xwe re neanîye.

Mixabin bi wan helwestên xwe yên şaş, av kişandine ser aşê xirabkirinê û her çûye xwîn hunda kirine. Îro jî rewş li holê ye, bayê kelecanîyek nû rojevê germ dike, ji dûr û kûr ve ev bayê hanê tê geşkirin. Hinek bi şik tevdigerin, hinek jê bi “hêvîyên nû” li pey xewnên xwe ne, hinek jî dibêjin li holê tu tiştekî rasteqîn tune ye, ev projeya ku di rojevê de ye, planekî qirêj yê li hemberî sîyaseta Kurdî ya derbarê Başûrê Rojavayê Kurdistanê de ye.

Di van bîst salên dawî de, me çendîn tecrube û pêvajoyên travmayê bi hevre dît û jîya… Ji bo em cardin xwe û civata xwe nexapînin, çavgirtî xwe navêjin gêrînokên tarî, divê em bi hişmendîyek netewî tevbigerin, bi helwest û bertekên netewî, bi têkoşîn û xebatên hevbeş navnîşanek millî derxin pêş.

Ji bo wî jî divê hemû alîyên Kurdî bo nexşerêya serkeftin û destkeftîyên nû bi hevre tevbigerin, derîyê dîyalogê vekin û projeyên çareserîyê yên hevbeş pêşkêş bikin. Ji bo bidestxistina statuyek, sîyasî, millî û coxrafî îradeyek Kurdî, temsîlîyek netewî û îdareyek hevbeş, pêvajoya îroyin fedekarîyek dîrokî li ser hemû alîyan ferz dike.

Helbet em baş dizanin alozî û pirsgirêkên mezin hene; rewşa îroyin tevî nakokî û problemên rojane rîskên dijwar û fersendên zêrîn derxistîye holê. Ji van derfetên nû sûd girtin girêdayî stratejîyek siyasî û bi hêzkirina temsîlîyek netewî ve girêdayî ye. Em baş dizanin ku li hemû beşên Kurdistanê, ji ber ku alîyên kurdî ne lihevkirî ne, li ser bernameyek millî û demokratik, li ser stratejîyek netewî û nexşerêyek hevbeş ne yekgirtî ne, di pêvajoyên dîrokî de lawaz û bêtaqat dimînin. Bêaqûbetî û destdirêjîya dagirkeran, rê li ber alîyan asê dike û ji derfetên zêrîn û destkeftîyên nû bêpar dihêle.

Em hemû dizanin ku îro li heremê guhertinên mezin diqewimin. Her dewlet, her netew, her civat li gorî pêşbînî û amadekarîya xwe dixwazin ji van guhertinan sûd bigrin. Divê li hemû beşên Kurdistanê alîyên Kurdî bi hişmendîya milletbûnê tevbigerin, rê li ber têkoşîn û xebatên hevbeş xweş bikin û nakokîyên hene bi aqlê kurdî çareser bikin. Divê derîyê dîyalogê li hev vekin û li hevdu gohdar bikin.


Îro li Başûrê Rojevayê Kurdistanê rewşek awarte, rewşek cuda heye. Sed sal şûnda em weke millet cardin bi rîskên mezin û bi derfetên bidestxistina destkeftîyên nû re rûbirû ne.
Hêvî dikim wê li Başûrê Rojavayê Kurdistanê jî, aqlê kurdî desthilatdar bibe û weke salên 1998 an li Başûrê Kurdistanê rê li ber statûyek siyasî veke. Weke hûn dizanin bi navbêrîya Emerîka sala 1998 an Birêz Mesûd Barzanî û birêz Celal Talabanî destê hev girtin û derîyê dîyalogê, derîyê Kurdistanek federal li başûrê Kurdistanê vekirin. Ev helwest bû destpêka pêvajoyek nû…

Em di wê bawerîyê de ne ku hemû partî û alîyên Kurdî li Başûrê Rojavayê Kurdistanê wê bi hişmendîyek netewî tevbigerin û ji bo çareserîyek sîyasî ya federalî ku bi axê ve girêdayî, pêwîstî bi bernameyek millî û demokratik, bi têkoşîn û xebatên dîplomatîk yên hevbeş heye. Divê li hemberî tifaqên dagirker û aparatên wan yên hov, alîyên Kurdî rojekî zûtirîn yekrêzî û tifaqa nav mala Kurdî weke mizgînîyek dîrokî bi miletê xwe re parve bikin.

# Riha nivîsandinê



**N. Vênûs Fayîq**
**W. Hesen Mukerem**




Nivîsîn cîhanek taybet e ku nivîskar diafirîne û tê de dijî. Tiştek bi navê ruhê nivîsandinê di nivîsandinê de heye, bi wateya ku hûn dinivîsin.

Tu tiştekî ji rihê xwe bi peyvên xwe yên mîna biharatê re tevlî peyvên xwe dikî û xwendevanê jîr wê vê hîs dike, ya ku nivîsandinê xweş dike ev e.

Yanî tu tiştekî ji xwe di nivîsê de dihêlî.
Lê çi me wekî nivîskar ji xwe razî dike?

José Saramago di wê baweriyê de ye ku ji bo nivîskaran şîreta herî baş xwendin e ku li ser tekez dike ne li zêde nivîsînê.Çimkî ya rihê nivîsînê pê geş dike xwandine ne nivîs bixwe..

Yek ji xurafeyên herî gelemperî yên di derbarê nivîsandinê de ev e ku nivîskar ji bo domandina nivîsandinê hewceyê gelek dema xwe bi tenê bin .

Dema ku em hewcedarê demê ne ku em bi xwe re tenê bimînin, ne hewce ye ku em wê bi nivîsandinê derbas bikin.

Ji ber ku dema nivîsandinê tune ye, ne erkek ji me tê xwestin, nivîsandin hewcedariyek e, ew dema ku rihê we jê xwestiye.

Nivîskara Brîtanî Janet Winterson dibêje: "Bi nivîsandinê ez hewl didim cîhanek biafirînim, dema ku min çîroka xwe vedigot çîrok vedgeriya li ser min, lê nivîsandin ji naveroka wê mezintir e.

Edebiyat me ji kûr ve mijûl dike, em zimanekî nû ji nû ve dîzayn dikin da ku nasnameya xwe derxînin holê, dûrî hevokên gemar, giştîkirin û nîv-rastî.

Niha gelek kes difikirin ku tişta herî hêsan nivîsandin e û jê re dibêjin nivîskar nizanin.

Çi karekî zor û zehmet e ku mirov bi nivîsên xwe cihê xwe di beşê geş û paqij yê bîranînên mirovan de bigre.

Tenê nivîsne ku tu ti dixwazane dest bo dibí û hizir ji vê yekê nakî ku bi sedema nivîsînê xwe jiyanke şahane bo xwe dabîn bikî.

Lê gava ku tu dibî daktîlo, baş û xerab dinivîsî.

Ne jî nivîsandin tê wê wateyê ku divê hûn bi her bûyerek an di her qadê de binivîsin dema ku wisa be ev pêşeya te heft behre heye û bextê te tuneye..

Romannivîsê Amerîkî Richard Ford dibêje: "Nivîsandin şaş û dijwar e û kes zorê li te nake.

Piraniya nivîskaran pir dinivîsin, û hin jî pir dinivîsin, ku ev yek ji hêla kalîteya berhemên wan ên edebî yên berhevkirî ve tê nirxandin.

Min qet nefikirî ku ez ji bo nivîsandinê zordar bûm. Min tenê biryar da ku ez bi xwe bikim.

Ez gelek caran dinivîsim dema ku ez nikarim tiştekî din bikim, an dema ku ez hestek bêkêmasî ya xirab heye, an dema ku ez xemgîn im û dema min heye."

Jean-Paul Sartre dibêje: "Nivîsandin xemeke pûç e.

Sartre dibe ku mebesta wan kesên ku bêyî ku bizanibin çima û bi çi armancê dinivîsînin.

Lê dibe ku ew bi mijarên ku ew pê bawer in û pê re têkildar in ve girêdayî be.

"Maryani brain Pol dibêje: Min li zanîngehê dest bi nivîsandinê kir, lê ji bo min nivîsandin tenê nivîsandina bîranînên xwe ye, ji ber ku ew bêtir li ser raman, hêvî, hewldan û bîranînên min e. Ji bo min nivîsandina helbestan celebek paqijkirinê ye."

Nivîsandin ne paqijî be jî, rehet e. Rûniştina li cîhê herî teng û derbaskirina dema xwendin û nivîsandinê ji rûniştina li cîhê herî fireh û nezanîna bi xwe re çi bike xweştir e.

Ya herî girîng, ji têkçûn û başbûnê re amade bin.

Divê em di serî de ji bo xwe binivîsin, ne ji bo kêfa kesên din, ji ber ku zehmet e ku meriv meriv xweş bike, yanî nebin yekî din ku merivên din xweş bikin. Bila rihê nivîsên me bi xwe be.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Di heyamê salekê de 345 kolber hatine kuştin û birîndarkirin




Gorî wan amar û raporên ku di heyamê salekê de hatine komkirin, anku tenê di sala 2024 a Zayînî deî li Rojhilatê Kurdistanê, 345 kolber û kasibkar, bi sedemên cudaye wek teqa hêzên rêjîmê, teqîna mînan, keftina ji bilindahiyan, bager û kurofe û sir û seqemê, kevtina bin reniyê, hatine kuştin û birîndarkirin.

Kolberniwsê bi piştgirêdan bi amarên komkirî di heyama salekê de ragihan ku 345 kolber û kasibkar hatine kuştin û birîndarkirin.

Di vê raporê de hatiye ku piraniya wan kolber û kasibkaran bi teqeya raste rast a hêzên çekdare rêjîmê li nawşên ser sinûr yan rêkên hatinûçona di navbera bajaran de hatine kuştin û birîndarkirin.

Gorî wê raporê ji hejmara 234 kolberên kû di vê amarê de hatine, 59 kes hatine kuştin, 286 kolber birîndar bûne. Ji koma wan 345 kolberên ku di heyamê salekê de hatine kuştin û birîndarkirin, 259 haletên wê bi sedema teqeya rasterast a hêzên çekdare rêjîma komara îslamî ve qewmîne.

Gorîv ê amarê di nava wan 345 kolberên hatinî kuştin û birîndarkirin, 18 ke temenê wan kêmtir ji 18 saliyê bûye, anku di temenê zarotiya xwe de bûne.

## Rêjîma Îranê li sala 2024 a Zayînî de zêdetir ji 883 bidar vekirin



Pêka rapora HRANAyê rêjîma Îranê li girtîgehên xwe de li sala 2024 a Zayînî de zêdetir ji 883 kes bidarvekirine ku bi herhevdanîn digel sala 2023, %18.3 zêdetir bûye.

Malpera mafê mirovî ya "HRANA"yê li dawî rapora salaneya xwe de ku li 6ê Befranbara 1403 a Rojî de belav kiriye, daye zanîn ku rêjîma Îranê li girtîgehên xwe de li sala 2024 a Zayînî, zêdetir ji 883 kes bidarvekirine ku bi herhevdanîn digel sala 2023yê, %18.3 zêdetir bûye.

Pêka vê raporê, rêjîma Îranê li vê salê de sizaya bidarvekirinê bi ser 207 kesan de sepandiye û herwisa sizaya bidarvekirina 54 kesên din jî li ji aliyê dadgeha rêjîmê ya bi navê "Dîwan alî Kişwer" ve hatiye sepandin.

Sizaya bidarvekirinê bi pêka vê amarê li sala 2024ê de %33.5 zêde bûye û ji vê amarê, 772 kes mêr, 26 kes jin û 5 kes jî temenê wan jêr 18 saliyê de bûye.

Li heftiya derbasbûyî de zêdebûna bidarvekirina xelkê û sepandina sizaya bidarvekirinê bo ser girtiyên siyasî li Îranê, nerizayetiyeke gelek zêde li navxwe û derveyî Îranê li pey xwe aniye.

Pêka vê raporê, ji gelempera bidarvekirinên sala 2014ê de li Îranê, %51.87 bi tohmetên pêwendîdar bi madên hişber û %40.45 bi tohmeta kuştina bi zanebûn, hatine bidarvekirin.

Herwisa HRANAyê daye zanîn ku parêzgeha Elborz bi 2 girtîgehên bi heşîmet bi rêjeya %21.21 û parêzgeha Fars bi rêjeya %9.91, pileyên yekem û duyem li sala 2014ê li bidarvekirinan de li nav parêzgehên Îranê de hene.

## Rêjîma Îranê bi awayekî hovane, ciwanên Kurd binçav dike



Hêzên Îtilaata rêjîmê bê belgeya yasayî û bi awayê xoserane, li bajarê Pîranşarê de 2 kes û li bajarê Şinoyê de jî 4 kes bi awayekî tundûtîj, bi lêdan û kutanê, binçav kirine û bo ciheke nexuya veguhastine.

Pêka rapora Kurdpayê, Roja Înê 7ê Befranbarê hêzên hov ên îtilaata rêjîmê bi êrîşkirin bo ser mala "Bêhzad Mehmûdî û Aram Mihemedî", xelkê bajarê "Peswê" ser bi bajarê Pîranşarê bi awayekî tundûtîj û bi lêdan û kutanê, ew welatiyên Kurd binçav kirine û bo ciheke nexuya veguhastine.

Herwisa roja Pêncşemî 6ê Befranbarê, hêzên îtilaat a rêjîmê, 4 ciwanên xelkê bajarê Şinoyê yên bi navên "Murad Ebdula Omerî, Nûredîn Melaelîzade, Tofîq Emînî û Mihemed Bêhrûzî" li êrîşkirina bo ser malê wan de deriyê malên wan şikandine û bi tundûtijiyê bi lêdan û kutanê, ew welatiyên Kurd binçav kirine.

Pêka vê raporê, hêzên hov ên îtilaata rêjîmê, dest bi ser mobaylên wan û hejmarek ji mobaylên malbatên wan de girtine.

Hêzên dije mirovahî yên îtilaata rêjîmê bê belgeya yasayî û bi awayê xoseranê êrîşkirne ser mala wan welatiyan û bi tundîtîjî, lêdan û kutanê, ew binçav kirine.

Heta belavbûna vê nûçeyê sedema binçacvkirin, tohmetên sepandî bi ser wan welatiyan, bi serastî nehatiye zanîn.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE    E - Mail: Agiri2003@gmail.com    Hejmar (485)